

Amnesty International: KRG bi erênî lê Asayîş ne însanî dixebite

Rapora sala 2009 an ya Amnesty International-AI berî nuha bi demek e kin belav bû. Rapora AI dide xuyanîkirin ku, pêşketina li Herêma Kurdistanê ji awira mafê mirovan ve ji nêz ve tê şopandin.

Rapora îsal bi giştî bi erênî nêzî pêşketinên li Herêma Kurdistanê dibe. Qala biryarên erênî û guhertinên qanûnî tê kirin û van pêşkêtinan bi helwêstên însanî yên Hikumeta Herêma Kurdistanê ve girê dide. Di raporê de rexneyên hişk li Asayîşê tê girtin. Rapor wisa ye:

"Dema mirov Herêma Kurdistanê û beşên din yên Iraqê dide ber hev, dikare bibîne ku nakokiyên hene li herêmê pir kêm in û zêde neketiye ber bandora tevliheviyan. Pêşketinên li wir erênî ne. Bi sedan girtî ku di nav wan de kesên bi salan nehatibûn dadgehkirin hebûn, hatin berdan. Qanûna biçûkxistina kesayetiyê (şerefê) hate pejirandin û ev biryar rê li ber zîndanîkirina kesan digire. Qanûna sînorkirina pir zewacî (pir jinî) di meha cotmehê de hate pêşkêşkirin".

Dîsa Asayîş û dîsa helwêsta ne însanî

AI di rapora 2009 an de, bi giştî li ser Îşkencekariya Hêza Ewlekariya Kurdistanê-Asayîşê kur dibe. Li ser karê wan yên ne însanî û yên kêfî radiweste. Wisa didome rapora AI:

"Li herêmê, di gel pêşkêtinên erênî, pêlîkirina mafê mirovan jî didome. Hêzên Asayîşê ji ber sucên xwe nayên cezekirin, xelk kêfî tene girtin û daîreyên resmî nikarin rewşa `wundakirina şexsan bi rêya zorê` têxin bin kontrolê.

Îşkence û lêdanên Asayîşê

Abbas Muhamed û dayika wî ya 60 salî Akhtar di meha adarê de bi şûpheya bombekirinê hatibûn girtin. Ew, 19 rojan di hucreyê de, di zindana giştî ya Asayîşê li Silêmaniyê hatin îzolekirin. Ling û destê Abbas di dema îşkecê de hatin şikestin. Elektrîk dane laşê wî, û ji bilî şokên elektrîkê, bi qabloyan lêxistin û îşkence pê kirin. Dadgehê, îdîayên li dijî wan di cî de nedît û biryara azadbûna wan di meha mijdarê de da. Lê Asayîşê biryara dadgehê nas nekir û ew berdedan.

Hişkiya li dijî jin û keçan

Raporên li ser hişkiya li dijî jin û keçan li malê, bi şeweyên lêxistin, şewitandin, qetilkirin û bicîanîna ferma jîholêrakirin-îdamkirinê bi destê xizm û xwedyên wan, dighêjin destê me.

Jinên ku bi karê mafê mirovan dadikevin, di bin gef û tehdîten xizmên xwe de ne. Daîre û rêvebirên fermî, di xebata eşkerekirina navên kesên suçdar û girtina wan de karekî serkevtî nekirine.

Di 11 adarê de, li Silêmaniyê, jinek ku ji aliyê dezgeha mafê jinan Asuda ve li hemberî tehdîten û hişkiyê dihate parastin, di odeya xwe de kete ber êrîşa xizmên xwe. Jin, ji ber lêdana xizmên xwe ji gelek aliyên laşê xwe êşîya, û bi şeweyekî giran birîndar bû.

Îdamkirin- darvekirin

Dadgehên li Herêma Kurdistanê biryarên îdamê didin û li wir darvekirina kesên girtî didome. Bi kêmasî 9 kes bi îdamê hatin cezekirin û 3 kes hatin darvekirin. 84 kes di hucreyên îdamê, 33 kes li Hewlêrê û 47 kes jî li Silêmaniyê, li benda roja darvekirinê ne.

Parlamentoya Kurdistanê mecalên bikaranîna qanûna li dijî terorê ya 2006 an firehtir û hêsantir kir, û li gorî wê cezayê terorê girantir bû.

Azadiya raman û nivîsê

Hejmarek rojnamevan û nivîskar ji ber nivîsên li ser pirsê bertîlxwarinê û rexnekirina rêvebirên herdu partiyên mezin (IKDP û PUK), û polîtîka Hikumeta Herêmê hatin tehdîtkitin û girtin. Rojnemevanek hate kûştin.

Soran Hama di 21 temûzê de li Kerkûkê li ber deriyê mala bavê xwe, ku ew cî di bin kontrola hêzên KRG de ye, kete ber êrîşa kesek çekdar.

Hama, bi nivîsên xwe, bertîlxwarin û parastina berjewendiyên xizmên rêvebirên herdu partiyên mezin (IKDP û PUK) bi destê herdu hêzan, eşkere kiribû.

Adil Hisêyn doktor e. Nivîsek wî ji awira bijijkî ve li ser pirsê cinsî û eleqatên homoyî di rojnameya Hawlati de belav bûbû. Ew bi 6 mehan hatibû cezekirin. Piştî dijderketina dengên navnetewî hatibû berdan”.

Wergêr: EuroKurd Human Rights